Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ~ YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar(72) Sibat 2007 z~2618 k Buha (15) p.s

Hevalê Şêx Alî azad e

Li 16.2.2007 an êvarî , destlatên ewlekariyê hevalê Şêx Alî sekretêrê partiya me ,partiya Yekîtî Ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê , li paytextê berdidin . Li roja 18.2.2007 an , li ser riya Şam dergehê bajarê Helebê , hin hevalan û bi beşdariya serokê partiya me mamoste Isma'îl Umer û li gel kesin navdar ji ragiyandina Şam , bi coşeke gerim pêşwaziya xebatkarê me yê hêja kirin . Piştre , li ser riya Efrînê , ew tev karwaneke mezin ku, bi ala Sûriyê , simbola partiyê û wêneyên birêz Ş. Alî xemilandî, ji heval , dost û hogirên wî bûn .

Karwana otombîlan bi rêket. Li kat yek , li Kefircenê , goristana Zarata Henên (Gora Nemir Nûrî Dêrsimî) , gelê me yê Kurd , heval û dost , gelek komên folklorî bi cilên rengîn , gul û çîçekan , dahol û zurne , çepik , lîliya jinan û sirûda Ey Reqîb , pêşwaziya xebatkarê xwe û wê karwanê kirin . Herweha di pêşiya sera Efrînê re , paşê çarşiya ku diçe Raco ta ku , giha lîstgeha werzîşê ya bajarê Efrînê. Li wir bi beşdariya bêtirî 6000 heval dost û bi hildan û libakirina , ala Sûriyê , simbola partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê , wêneya hevalê Şêx Alî , vestîval destpêbû . Destpêkê Avokat Selah Kênco li ser girîngiya hevpişkiya gelê Kurd di rêvebirina Sûriyê de , biratiya gelên Sûriyê ji hev re, azadî , wekhevî û aştiyê , yekîtiya nîştimanî û berdewamiya guftogo di navbera tevgera Kurd û hêzên nîştimanî li Sûriyê rawestî. **D.R.(10)**